Nawisk

Çima wêjevan û rewşenbîrên me yên kal danpêdanê bi rivêştê genc nakin?

Tehsîn Navişkî

Çaxê em wer in û nêrînekê li dîroka çand û hunerê kevne welatê girîkan bikin, wê ji me re aşkira be, her ji çaxên zana û fîlesofên navdar, Sukrat, Pilato, Ersto û rewşenbîr û wêjevanên wanên navdar; mîna Esxîlos, Yorîbîd û şahsiwarên din yên çand û hunerê wî welatî, wê ji mere eşkera be, her fîlesofek û wêjevanek û rewşunbîrek nû hatî di qada zanîn û wêjevaniyê de; hinek guhorîn, bi cisaret li pey nêrîna xwe, li hizir û mîtodên zana û rewşenbîrên, çaxê berî xwe kirine.

Tiştê bi nêrîna min ji vê kiriyarê bi biha û spehî, piraniya caran, danpêdan bi şêwekî berhozane û lojîkî, ji layê kevne Mamostayê rexne li hizir û bîrên wî, ji layê xwînd karê nû hatî di qada rewşenbîrî û û wêjeyê de, di hat kirin. Ev sererayî gengeşe û dan û standina sebaret mijarê li neqeba herdu layenan dihat kirin.

Destpêşxeriya ((Eristo)) bi zivirandina hunerê şirê û pîtedan bi hebûna wê; wek hunerekê zêndî, piştî Mamostayê wî ((Pilato)) ji (komara) xwe ya navdar havêtî ye der û hunerê wê newergirtî, nimonekê navdar e di dîroka çand û hunerê cîhanî de ku çand û hunera wan heya îro li ser vê binaxey werareka berçav dike.

Helbete welatên pêşkevtî heya Îro li ser vê rêbazê di berdewamin.

Anko xwîndkar tiştên nû li

dahînana Mamostayên xwe zêdedkin û caran hizir û bîrên wan tevlî hev dibin û gelek caran jî hizir û bîrên Mamostayên xwe retdkin û bi singekê şarstanî û demokrasî dihên wergirtin û danipêda pê dihê kirin.

Lê mixabin ev saxlete, bi nêrîna min ya kesokî di çand û hunerê kirmancî de; heke hinek cara n hebe jî, lê bi şêwekê gişti pir lawaze. Anko piraniya berebabên kevin, ji xwediyê xwe nagirin, xwîndkarên wan şaşyên wan diyarbkin ji wan pêşkevtî tirbin.

Anko danipêdanê bi hiziru bîrên berebabên genc nahê kirin. Li ser vê şengsitî, caran em dibînîn, stêra genicekî ji nişkanive di biyavekê çand û hunerî de geşidbe û bi germî hate diqada çand û hunerê kurdî de. Lê mixabin rewşnbîrên berî wî; wek Mamostayên wî, bi fihêtî dibînin, bi serferazî pêşiwazyê li roniya stêra nû hatî bikin.

Caran hinek hunermend û nivîskar û rewşenbîrên Mamosta hene li wê jî ranawestin, dibe wêvetir diçin û çengê digel hizir û boçonên wî yên nûxwaz dikin û hemû şiyanan bi kardihînin û dibine asteng di riya wî de ko bi pêş nekeve. Ez weha li vê kêşê dinêrim; ev saxleteka din ya nerênî ye, ya ko dibe asteng di rêka çand û hunerê kirmancî de û wenake bi pêşibkeve.

Her ji vir, ez ji berebabên di bin Mamostayên nivîskar û turevanên dihên di qad û çand û hunerên kirmancî de dixwazim, hizir û boçûnên wan bi şêwekê nerênî werbigirin û pişteva niya wan bikin û danê bi nêrînên wan yên nûxwaz bidin; heya beruvajî hizir û bîrên wan jî bin. Bila gutina zana û rewşenbîrê ferensî voltêr, demê gotî: ((bila ez digel boçûna te nebim; lê ezê berhevim xwe sera azadiya boçûna te bidim koştin)). Bo xwe bikine rêbazeka nemir û li dûv biçin; heya em binaxê pêşkevtineka hevçerix ji xwe re danin.

Ez di wê bawerê deme; heke em hemû rêzê li bîr û boçûnên hevdu negirin, bêy hizirekê bo cudaya jiyê hev bikin, pîvajoya çand û hunerê me nikare pêş bikeve û her wê li dawiya karwanê xelqekê din bimîne, helbet ev jî bi hîç rengekî di xizmeta welatê me yê îro pir pêdivî pêşveçona çand û hunerî tuneye.